# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (319)-taybet:
# Heft sal ji dagîrkirina Turkiyê... /336/qurbaniyên pakrewan û bêgunehên sivîl, jê /66/zarok û /54/ jin, û jê /37/ di navboriya sala dawiyê de

**Wergerandin ji Erebî**

Heft sal di ser dagîrkirina Turkiyê (ya 18 ê Avdara 2018an. Z) ji Herêma Efrînê re - Bakur Rojavayê Sûriyê, bi hevkariya Milîseyên bi navê "Artêşa Niştimanî ya Sûrî" ya bi Hemahengiya Sûrî - ixwanî ve girêdayî bû, û di bin perda fetweyên "Îmam Elxetîb", "Zanyarine Misilman en tundrew" û "Encûmena Islamî ya sûrî - Istanbol" de, derbas dibin... Û hîn jî binpêkirin û tewanên cûrbecûr berdewam in, bi ser derbasbûna bêtirî sê heyvan di ser roxandina Rijîma "El'sed - El'be'is" re, û derbasbûna Amûra "Asayêşa Giştî" ya girêdayî "Hikometa Şamê" bo herêmê, û Dagîrkeriya Turkiyê jî hîn heye, û piraniya milîseyan biryargehên wan ên leşkerî û nivîsgehên wan ên ewlehî û abortiyê bi dest de ne, nemaze ku ew li gor biryara "Kongira serfiraziyê" ya li 29.01.2025an. Z hatiye li darxistin, bi rengekî nehatine helandin.

Me di rapora xwe "**Efrîn di bin dagîrkeriyê de (281) - taybet 18.03.2024. Z**" - girêdana wê ya êliktironî li jêr e - bi dokoment navên /299/ qurbaniyên pakrewan û bêgunehên sivîl ji xelkê Herêma Efrînê belge kiribû, jê /64/ zarok û /50/ jin di siya Dagîrkeriya Turkiyê de (18 Avara 2018an. Z - 16 Avdara 2024. Z) jiyana xwe wenda kiribûn, di mercên têvel de (di bin işkencê de yan bi qurşînên zindî û hemî rengên din ên kuştina mebestkirî, û hin bi teqînan û bombeyên zemînî, yan dema derbasbûna Turkiyê, yan jî bi topebarana herêmên penaberiyê yên koçberên Efrînê " gund û bajarokên Şehba'i û Şêrewa - Bakurê Heleb" û teqîna bombeyên zemînî tê de, û di encama berdewambûna avêtina qurşîn û gule û topan di navbera Artêşa Turkî û milîseyên wê ji alîkî ve û Artêşa Sûrî û hevalbendê wê ji alîkî din ve li herdu aliyên hevgîhanê li Çiyayê Lêlûn) mirine yan hatine kuştin; Ji bilî yên di bin zext û fişarên jiyanî yên hişk ên dagîrkeriyê de mirine, û herweha yên ku di encama erdheja /6/ê Reşmeha 2023an. Z de, bi sedema xemsariyê, derengiya piroseyên rizgarkirinê di siya kêmbûna kanînên Berevaniya Sivîl de û ranebûna Destlatên Dagîrkeriyê bi erk û stubariyên xwe, canê xwe ji dest dane, û nemaze jî rola Turkiyê li bermberî xişim û bêtara erdhejê li Herêma Efrînê tunebû.

Û li navboriya her duwazdeh heyvên borî de, me navên /37/ qurbanî û bêgunehên sivîl ji xelkê Herêma Efrînê belge kiribûn, jê du zarok û /4/ jî jin, bi kuştina yekser, an bombebarana Turkiyê, yan bi topebarana rijîma berê, yan di zîndanê de, yan ji tirs û qehre re, yan li dema penaberiyê ji Gundewarê Heleb ê Bakur, yan li ser xêzên hevgîhanê di navbera "Desteya Tehrîr El'şam" û "Rêvebiriya Xweser li Taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê li Bajarê Heleb" de, û yan jî bi teqîna bombeyên zemînî, jiyana xwe ji dest dan.

**Ew cangorî ev in:**

1- "**Erîfe Cimo Heyder** /70/sal" ji Gundê "Kibêşînê" - Çiyayê Lêlûn ê ku di bin desteserkirina Milîseyên "Feyleq El'şam" de, li 09.03.2024an. Z, di encama topebarankirin Artêşa Sûriyê û hevalbendên wê ji maleke têde re.

2- "**Elî Ebid El'rehman Mihemed** /18/sal" ji xelkê Gundê."Gemrûkê" - Navça Mabeta, li 17.03.2024an. Z, di encama topebarana Artêşa Turkiyê û milîseyên wê ji derdora Bajarê "Tulruf'etê" re - Gundewarê Heleb a Bakur, ê tijî koçberên Efrînê yên zorane bû.

3- "**Reşîd Ebdo Hemo** /41/sal" ji koçberên Bajaroka Mabeta, li 24.03.2024an. Z, di encama topebaran Artêşa Turkiyê û milîseyên wê yên Sûrî ji derdora Bajarê Tilrif'etê re - Gundewarê Heleb ê Bakur.

4- "**Cangîn Osman Ne'isan** /36/sal" ji xelkê G."Rûta" - N. Mabeta, li Avrêla 2024an. Z, di hundir Hepsa Çobanbegê/El'ra'î - Herêma Babê, di encama îśkencekirin û pîsbûna mercên zîndanê de, ji dema girtina wî tevî hevjîn û dê û bav û herdu birayên wî û hevjîneke yekî ji wan ve, li 07.06.2020an. Z.

5- "**Cemal Elî kurê Mihemed Gulîn** /27/sal" ji G. "Dargirê" - N. Mabeta, li 21.06.2024an. Z, ji ber birîna wî li şeva Çarşemê 19.06.2025. Z, piştî armanckirina wî ji aliyê giropeke çekdar ji Milîseyên "Firqit El'hemze" ve, li Rojavayê G. "Coqê".

6- "**Qenber Hisên Elo** /55/sal" ji xwedîpêwîstiyên taybet û ji xelkê G. "Kêla" - N. Bilbilê, li 08.09.2024an termê wî ji xezaneke avê ye zemînî ye ji bêtonê/çîmento li nêzîk çateriya G."Zerka" yê hevcîwar hate derxistin, û ew ji berî/23/rojan hatibû wendakirin, û bijîşk kuştina wî tekez kir.

7- "**Xalêd Mihemed Muhemed** - Zayîn 2002. Z" ji koçberên G."Bêlê" - N. Bilbilê/Efrîn, di encama topebarana Artêşa Turkiyê û milîseyên wê yên Sûrî ji Gundê "Bêroniyê" re - Gundewarê Heleb ê Bakur, li Roja Şemiyê 07.09.2024an. Z.

8- "**Mistefa Nûrî El'nasêr** /24/sal" ji Malbat "Urnê/Êla El'umêrat" ji G. "Astêr" - Bakur Rojavayê Bajarê Efrînê, Êvara Sêşemê 25.09.2024. Z, li pêş nivîsgeha bazirganiyê ya makînan li bajêr, di encama avêtina qurşînan de, ji aliyê anîndeyekî ji Gundewarê Heleb ê Rojava ve.

9- "**Ibrahîm Mihemed Gulîn Şêxo** /55/sal" ji G. "Qêsim" - N. Reco.

10- "**Kurdistan Xelîl Weqas** /33/sal" ji Bajaroka "Kefirsefirê" - N. Cindirêsê.

11- Û zaroka wê "**Melek Şiyar Hembaşo** /5/sal" ji Bajaroka Mabeta.

12- "**Mihemed Weqfî Mihemed** /47/sal" ji G. "Çema" - N. Şera.

Herçar li Êvara Çarşemê 23.10.2024an. Z, di encama topebarana Bajarê Tilrif'etê de - Gundewarê Heleb ê Bakur (ê ku tijî koçberên Efrînê), ji aliyê Artêşa Turkiyê û milîseyê wê yên Sûrî ve.

13- "**Mihemed Ebid El'kerîm Sîdo** /43/sal" ji xelkê Bajarê Cindirêsê, Êvara Pêncşemê 24.10.2024. Z, bi xwînsekneke dil, di encama tirsa ku pê re çêbûye de, ji ber topebarana Gundê "Tilsosînê û Çadirgeha Serdemê ya hevcîwar pê re" li Gundewarê Heleb ê Bakur, ji aliyê Artêşa Turkiyê û milîseyên wê yên Sûrî ve.

14- "**Heysem Ebid El'rehman Îse** /42/sal" ji xelkê Gundê "Aqûbê" - Şêrewa/Çiyayê Lêlûn ê ku di bin desteserkirina Artêşa Sûriyê de bû, li 19.11.2024an. Z, ji ber topebarana gundê wî ji aliya Artêşa Turkiyê û milîseyên wê yên Sûrî ve.

15- "**Ekrem Mehmûd Nebo** /69/sal" ji xelkê G. "Anqelê" - N. Şiyê, li 12.11.2024an. Z, ji qehra re bi seknexwînê mir, di encama fişara ku Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" ji bo dandina vêrgiyeke mezin e werza zeytûna li ser dane çêkirin.

16- "**Henan Mihemed Mecûno** /36/sal" ji G. "Bircikê" - N. Cindirêsê.

17- "**Henan Mihemed Mûşo** - Zayîn 1962. Z" ji G. "Qurtqilaqê" - N. Şera.

18- "**Ebid El'rehman Şêx Mûse Cum'e** /40/sal" ji G. "Ze'irê" - N. Bilbilê.

19- "**Şe'iban Ehmed Mehmûd** /38/sal" ji G. "Şingêlê" - N. Bilbilê.

20- "**Yeşar Ibrahîm** /25/sal" ji Efrînê.

21- "**Ehmed Cimo Hiso** /72/sal" ji G. "Qîbarê" - Efrîn.

22- "**Nazê Xelîl Elo** /42/sal" ji G. "Xilalka" - N. Bilbilê.

Herheft li 01.12.2024an. Z mebestkirî bi qurşînên jîndar hatin kuştin, piştî talankirina Milîseyên Sûrî yên bi ser Turkiyê ve Herêma Şehba'i û hin gundên Şêrewa li Gundewarê Heleb ê Bakur, a tijî koçberên Efrînê.

23- "**Ebdo Ebid El'menan Ebdela** - zayîn 1960. Z" ji G. "Qitmê" - N. Şera, li 03.12.2024an. Z, bi qurşînekê di serî de, piştî devavêtinekê di navbera wî û milîseyan de (yê ku avahiyên karkirên kargehên bergiriyê yên li rex Bajaroka Sifîrê li Gundewarê Heleb ê Rojhilat desteser dikirin).

24- "**Mihemed Ehmed Xidiro** /50/sal" ji G. "Qestelê Xidiriya" - N. Bilbilê, piştî girtina wî ji aliyê rêbenda Milîseyên "Firqit El'hemzat" ve, li çateriya G. "Bêlê" - N. Bilbikê, li êvara 04.12.2024an. Z, li ser riya vegera wî ji Herêma Şehba'i, û bo Navenda Bibilê hate birin, li wir hate lêkolîn û îşkencekirin, û li siba din li nexweşxaneyeke Efrînê termê wî radestî xwediyan bû.

25- "**Memdûh Bekir Osman** /60/sal" ji Êzdiyên G. "Qitmê" - N. Şera, piştî ku li nîvşeva 29-30.11.2024an. Z li Taxa "Meydanê" - Bajarê Heleb yekser qurşîn lêket, û teksiya wî ya giştiyane/servîs jî hate dizîn.

26- "**Mihemed Mistefa Hemlîko** /24/sal" ji G. "Me'imila" - N. Reco, di encama armanckirina makîna wî de (ya ku ew û dê û bavê wî tê de), li 30.11.2024an. Z, li ser xêzên hevgîhanê di navbera "Desteya Tehrîr El'şam" û "Rêvebiriya Xweser li Herdu Taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê" de - Bajarê Heleb.

27- "**Cemal Hisên Mursêl** /45/sal" ji G. "Qurtqilaqê" - N.Şera.

28- Û kurê wî "**Hisên Cemal Mursêl** /24/sal".

Herdu li 30.11.2024an. Z hatin kuştin, li dema armanckirina makîna wan li ser riya herdu gergehên/gerokên "Şîhan" û Gulîstana "Eşrefiyê" digihîne hev, li xêzên hevgîhana navbera "Desteya Tehrîr El'şam" û "Rêvebiriya Xweser li herdu Taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê" - Bajarê Heleb.

29- "**Hiyam Yûsêf Reşîd** /50/sal" ji G. "Diraqliya" - N. Bilbilê.

30- Û "**Ancí Yûsêf Reşîd** /14/sal" ji G. "Diraqliya".

Herdu di encama armanckirina baseke hilgêran/rikaban de hatin kuştin, li 02.12.2024an. Z, li ser xêzên hevgîhana di navbera "Desteya Tehrîr El'şam" û "Rêvebiriya Xweser li herdu Taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê - B. Heleb", piştî revînê tevî hinek din ji Herêma Şehba'i.

31- "**Ebid El'rehman Xelîl Mirşid** /59/sal" ji G. "Miskê Jêrin" - N. Cindirêsê, li 01.12.2024an. Z, di encama xwekuştineke bi qurşînê di seriyê xwe de, li Bajaroka "Tilqirahê" - Herêma Şehba'i, di mercine nediyar de, li dema reva sivîlan ji pêş milîseyên ku êrişî herêmê kirine.

32- "**Se'îd Ebdo Ne'iso** /85/sal" ji G. "Turindê" - Başûrê Bajarê Efrînê, li 02.12.2024an. Z, li dema penaberbûnê ji Herêma Şehba'i.

33- "**Nûh Mihemed Reşo** /4/heyv" ji Bajaroka Bilbilê, li 03.12.2024an. Z, li lîstgeha Bajarê Reqê, di encama sermê, cefê û birçîbûnê de, li ser riya penaberiya zorane ya ku bêtirî /30/katî dirêj kiriye, ji Herêma Şehba'i li Gundewarê Heleb a Bakur ve bigir ta B. Reqê.

34- "**Nûrî Horîk Heftaro** /65/sal" ji G. "Heftêr" - N. Bilbilê, li siba 03.12.2024an. Z, li Bajarê "Tebqa", bi seknexwîneke nişkeyî, ji ber qehra penaberbûna sert û zehmet ji Jerêma Şehba'i.

35- "**Ebid El'hemîd Reşîd Mistefa/Malbata Egêl** /58/sal" ji G. "Qurnê" - N. Bilbilê, Êvara Sêşemê 07.01.2025an. Z, piştî derketina wî ji mizgeftê, ew bi awakî mebestkirî bi qurşîneke jîndar hate kuştin, li ser destê du çekdarên serçavgirtî li ser matoreke duloqî.

36- "**Hemod Umer Berekat** /29/sal" ji G. "Soxanekê" - Navça. Şêrewa, li 18.01.2025an. Z, di encama teqîna bombeyeke zemînî de (ye ku di bin xezaneke avê de, di maleke koçberbûyî de li gund hatibû çandin), û bê zanîn ku çekdarekî ji milîseyên Hêza Hevbeş (Firqit El'sultan Silêman Şah, Firqit El'hemzat) ew neçar kir ku vêre xezên veke, da ku bidize.

37- "**Hemîd Ehmed Hesen** /60/sal" ji G. "Aqûbê" - N. Şêrewa, li 03.03.2025an. Z, wexata ku pêle bombeyeke zemînî ji bermayên şer kir û teqiya, li nav zeviyeke zeytûna ye wî li Rojavayê "Aqûbe" bi aliyê G. "Basilê" ve.

Tewanên ku di dermafê sivîlan de têne kirin û yên ku derbasî asta tewanên şer û tewanên dijî mirovahiyê dibin, tê xwestin ku ji hemî aliyên ku radigihînin û dibêjin em bi perensîpên mafên mirovan pabend in werin pirotestokirin û şermezarkirin, lêkolînkirinên serbixwe û aşkere bêne çêkirin, nemaze jî ji aliyê komîta lêkolîna navdewletî ya serbixwe ya girêdayî Sûriyê, berpirsiyar û cîbicîkerên wê werin diyarkirin, û kar li ser cezakirina wan û berdêlkirina xwediyên qurbaniyan û bi awakî razberî û şênberî. Çimkî destlatên Dagîrkeriya Turkiyê, milîseyên tundrew û nandozên pêve girêdayî piraniya binpêkirin û tewanan li dijî nediyardeyê tomar dikin an jî pêngavine rûcesneyî û wêneyî davêjin, ta ku tewankar ji cezakirinê bifilitin, û bi ser de jî neçarkirina xwediyên qurbaniyan ku dev ji mafên xwe berdin û bi lihevhatineke rûcesneyî -di gelek rewşan de- razî bibin; Û heyameke lêhatî û guncaw ji bo vegera koçberên zorane bi rengekî ewle û rûmet peyda nabe, û kend û nerazîbûn jî ji bo radestkirina malmewdanên ên vedigerin hene, bi ser ku Amûra "Ewleya Giştî" ya girêdayî Hikometa Şamê ya niha navenda bajêr jî radest biriye.

Lê, Hikometa Anqerê di ber kiriyarên ku li herêmê û dermafê xelkê wê de têne kirin  berpirsiyar dimîne, Ji ber ku ew dewleta dagîrkeriya leşkerî ye û xwediyê desteseriya rasteqîn e, û tu gavên pirektîkî, zagonî û ewlehî ji bo parastina jiyana sivîlan navêje; Bervajî wê, ew hîn li ser kiriyarên artêş û nandozên xwe ji milîseyan vedişêre, wan diparêze û bi ser dijîtiya Kurdan ve - li kû dibin bila bin - têve dide û destek dike; Û bi wê yekê, ew rêderketin û berevajîkirinin bi robet/mezin ji zagona navdewletî ya mirovahî, belgenameya Netewên Yekgirtî û hevpeymanên navdewletî re çêdike.

Xelkê Efrînê bang li Civaka Navdewletî û Hikometa Serok Ehmed El'şeri dike, da ku bi rola xwe rabin û rêgirikê ji van binpêkirin û tewanan re dînin , û bi koçberên ku bi zorê koçberbûne re alîkar bin da ku bi şêwakî bi'ewle vegerin cîwarên xwe, û mal û milkên xwe bi renegekî ewle radest bibin, û herweha anîndeyan bi aliyê vegerê bo herêmên wan ên resen de têvedin, û bi berpirsiyarî kar bikin da ku dagîrkeriya Turkiyê bi dawî bikin, û milîseyên tundrew û nandoz ji holê rakin, ji bo Efrîn vegere serweriya Suriyê û rêvebirina xelkê wê yê resen, bi riya cîbicîkirina hevpeymana ku di navbera Serok Ehmed El'şeri û Mezlom Ebdî serkêşê Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) hatiye îmzekirin de.

18.03.2025an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

…………………

**Lîsteyên nav û wêneyên pêre:**

- Lîstak bi nav û wêneyên /37/ qurbaniyên şehîd û bêgunehên sivîl ji xelkê Herêma Efrînê, di siya dagîrkirina Turkiyê de (16.03.2024an. Z - 18 Avdara 2025. Z) - /2/ lîste.
- Hevgirêdana doseya qurbaniyên Pakrewan û vêgunehê sivîl ji xelkê Herêma Efrînê di navbera (18 Avdar 2018. Z - 18 Avdara 2024an. Z):

https://yek-dem.net/ku/?p=14731

## Lîstak bi nav û wêneyên /37/ qurbaniyên şehîd û bêgunehên sivîl ji xelkê herêma Efrînê , di siya dagîrkirina Turkiyê de (16.3.2024an.z- 18.3.2025an.z)



1- Erîfe Heyder



2-Elî Mihemed




3- Reşîd Ebdo Hemo



4- Cangîn Ne›isan



5-Cemal Mihemed



6- Qenber Hisên Elo




7- Xalêd Mihemed




8- Mistefa El›nasêr




9- Ibrahîm Mihemed



10- Kurdistan Weqas




11- Melek Hembaşo




12- Mihemed Mihemed




13-Mihemed Sîdo




14-Heysem Îse




15- Ekrem Nebo




16- Henan Mecûno




17- Henan Mûşo




18- **Ebid El›rehman Cum›e**



19-Şe›iban Mehmûd



20- Yeşar Ibrahîm




21- Ehmed Hiso



22-Nazê Xelîl Elo



23- Ebdo Ebdela



24- Mihemed Xidiro




25- Memdûh Osman




26- Mihemed Hemlîko



27- Cemal Mursêl



28- Hisên Mursêl




29- Hiyam Reşîd




30- Ancî Yûsêf Reşîd

**Lîsta /1/-18 Avadarê 2025an**

**Amedekirin: Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn/Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

**Lîŝtak bi nav û wêneyên /37/ qurbaniyên şehîd û bêgunehên sivîl ji xelkê herêma Efrînê , di siya dagîrkirina Turkiyê de (16.3.2024an.z- 18.3.2025an.z)**



36- Hemod Umer Berekat



35- Ebid El›hemîd Reşîd Miŝtefa




34- Nûrî Horîk Heftaro




33- Nûh Mihemed Reşo



32-Se›îd Ebdo Ne›iso




31- Ebid El›rehman Xelîl Mirşid




37- Hemîd Ehmed Hesen

**Lîŝta /2/-18 Avadarê 2025an** **Amedekirin: Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn/Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**